Newroz Hejmar ( 71) Rûpel (7) Berçele 2006z – 2618k

# Banga Pişteva niyê

**Girtina Şêx Alî baweriya me bi xabat û doza gelê me geştir dike**

**Li** 20-ê 12- 2006 –an katijmêr -7- Êvarê, li bajarê Helebê li çayxana NEXÎl, hevalê me sekretêrê parta Yekîtî ya demiqurat a kurd li sûriyê ( YekÎtÎ) ji hêla ewlekariya leşkerî ve bi awakî remkî û ne mirovane , birêz Mihyedîn Şêx Alî têye girtin û ta niha jî,rewşa wî ne diyar e. Bêguman ev ton sitîl û awekarên rêjimê û berdwamiya zagonên awarte dide nîşan ku,hêmenî û hevpîvan di hundir vê welatî de nine ;vêça jî, hemwelatî di heyameke biv û bi tirs de li ber xwe didin! Wisan jî,em weke rêxistina jina kurd ya parta yekît ya demokirat a kurd (Yekîtî)li bajarê helebê , bi navê xwe û hemû heval, dost û hogiran bang li hemû hêzên demoqirat, komîteyên mafên mirovan û raya gişti li der û hundir welêt dikin ku, bi lez pir çalakiyên rengane û balkêş li raberî reng û awên rêjîmê yên nepaqij û tund ku , evqas sal li ser singê hemwelatên me û nemaze li yê gelê me palvedaye bikin . Daku rewşa hevalê me yê gewire were naskirin û bi lez jî were berdan , li hembêza xwedî , heval , jin û zarokê wî yê pêncmihekî, û hembêza gelê kurd li sûriyê rojekê pêş ve vegere.

- **Azadî ji xelatkarê pîdar Mihyedîn Şêx Alî re**
- **Azadî ji hemû girtiyên rêzanî yên bîr û ramanê di girtîgehên sûriyê de.**

**Rêxistina jnan li Helebê ya PartaYekîtî Ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê ( Yekîtî)**

**30\12\2006an**

**********

**********

**Dumahîk: Pişteva nî**

Bi awakî dî , daxwaza avakirina welatekî demoqrat tê de mafên mirovan , azadiyên bingehîn û mafên me yên netewî û rewa bêne parastin pûç û vala bike.

Em ji hêla xwe ve , di hundir weşana Nweroz de , bi navê xwe û hemû heval , dost , hogir û xwendevanên Nwerozê vê curekarê rêjîma Sûriyê şermezar dikin , bi dengekî bilind bang li hemû rêxistnên mafên mirov, layên siyasî –civakî li der û hundir welêt dikin ; daku ew jî bi rola xwe rabibin, hemû rengên pestê li Sûriyê bikin , ji bona rojekê pêş ve heval bavê Biriyar mihyedîn Şêx Alî û hemû gitiyên bîr û ramanan serbest bibin .Da rêjîm rêz li mafên mirov û azadiyên gelamper û bingehîn bigire . Da Sûriya me , çareserkirina pirsa gelê me yê Kurd û demoqrasiya civak û dewletê bipejirîne .

**Azadî û serbestî ji hemû girtiyên bîr û baweriyan li her deveran .**